

Koletiya nûjen li Avûstrlyayê rûdide



Koletiya nûjen wê demê ye zorbêjî, gef an bêhêvîti bi kar werin ku ji kesan behre were girtin û ew ji azadiyê bêpar bibin. Ev li Avûstrlyayê sûcên giran in û qaçaxa kesan, koletî, koledarî, zewaca zorê, karê zorê, girêdana deyndariyê, şiklên her nebaş ên karê zarokan, bikaranîna ji bêhêvîtiyê bo kar an xizmetan in.

Eger hûn yan kesekî hûn nas dikin tê behre wergirtin, em dikarin arîkariya we bikin.

Bo agahî yan hevpirsîna neeskere, ji kerema xwe bi Xaça Sor a Avûstrlyayê re pêwendiyê çêbikin. Ji 1800 113 015 re telefon bikin an jî national_stpp@redcross.org.au re e-name bikin

Divê li ser kar bi we re baş reftar bibe.



Eger hûn yan kesekî hûn nas dikin:

- Neçar bibin kar bikin an ser karî ewle nebin
- Gelek saetan kar bikin bêyî ku bêhna xwe vedin
- Diravê kesekî rast nedin
- Diravêkî deyn ê mezin bidin bo bikarhêner an karsazekî ji ber sefer, mayîn, cil û kinc, xwarin, çûyînhatin an belgeyên karkirinê
- Nikaribin cihê xwe yê karkirinê biterikînin an ser mercan gotûbêj bikin
- Li ser karî gef an tirs ser kesekî hebe, wekî bibêjin hûn ê bi paş ve werin vegerandin yan endamên malbatê dê zîyanê bibînin
- Nikaribin xwe bigihînin pasaporta xwe yan belgeyên din ên pênaseyê
- Li mala kesekî kar bikin û ji ber delîlên şexsî yan civakî gelekî kêr bikarin biterikînin
- Ji kesekî re gotinên nebaş, reftarên piçûkkirinê, destdirêjî yan tundî werin kirin.

Arîkarî mimkin e

Xaça Sor hevpîrsîn û piştevanîyê dike, û dikare bo arîkariyê we bişîne beşên din ên xizmetê. Xizmeta wergera devkî heye. Ji 1800 113 015 re telefon bikin an ji national_stpp@redcross.org.au re e-name bikin.

Herwiha bernameyêke piştevanîyê heye ku arîkariya gel dike ji yana xwe ji nû ve çêbikin. Ev bername arîkariya kesên dike ku cihekî ewle bo jiyanê peyda bike, piştevanîyê dike muqatebûnên bijîşkiyê, rawêjkarî û hevpirsîna hiqûqî û koçberiyê, piştevanîya malî hebin, bo perwerde û hînkirinê yan peydakirina kar, û têkiliyên civakî arîkariyê dide. Xaça Sor dikare li bara vê bernameyê agahiyên pirtir bide.*

Eger lezgîn be yan ser ewlehiya kesekî gef hebe bi 000 ji polis re telefon bikin. Bo raporkirina mijareke ihtimalî ya koletiya nûjen bi 131 237 ji Polisê Federal ê Avûstrlyayê re telefon bikin.

Mafên xwe nas bikin

Hemû karkerên li Avûstrlyayê mafên wan ên bingehîn hene ku qanûn wan diparêze. Ev qanûn bo hemû karkeran e hetanî yê ji welatên derve, bêyî ku guh bide qasa mayîn an cûreya vîzaya wan li Avûstrlyayê.

Bo agahiyên li bara mafên cihê xwe yê kar, hûn dikarin serdana www.fairwork.gov.au bikin, yan bi 13 13 94 ji Fair Work Ombudsman re telfon bikin.

Eger pêdiviya we bi wergêrê devkî heye, bi 13 14 50 ji Beşa Wergera Nivîskî û Devkî re telefon bikin.

This Modern Slavery grant activity received grant funding from the Australian Government.

*Wezareta Xizmetên Civakî xercê Xaça Sor a Avûstrlyayê dide bo ku Piştevanîya Bernameya Kesên Qaçxubûyî pêk bîne.